



# Alîkariya koçberîyê li Australya

## Alîkariya koçberî çi ye?

Alîkariya koçberîyê ew e ku ksek zanyarî, yan tecrubeyan bi kar bîne di karûbarên koçberîyê ji bo alîkariya serlêdanên vîzeyan yan jî di mijarên din yê vîzeyê wek:

- amadekirin, yan jî alîkariya amadekirina serlêdana vîzeyan yan jî belgeyên din
- şîretên li ser serlêdana vîze yan jî mijara vîzeyê
- nûnertiyê bike yan jî amadekirinê ji bo dedgehê yan nîrxandina rayedar derbarê vîzeyê.

## Alîkariya koçberan ne ev in:

- ji bo amadekirina (yan jî alîkariya amadekirina) serlêdanekê yan jî belgeyêke din, wek mînak skan kirina belgeyan û şandina belgeyan.
- dabînkirina xizmetên wergêrîya devkî û ya nivîskî.
- Şîretkirina kesekî din û ji wan re bêjî divê ew ji bo vîzeyê serlêdan bikin
- agahdariya ku ji aliyê kesê sêyemîn ve hatiye hilberandin, bêyî ku li ser agahdarî komênt bike yan jî agahdariyan şîrove bike

## Kî dikare alîkariya koçberî li Australya bide?

Tenê ajansên koçberî yê qeydkirî, karmendên yasayî yê Australî yan jî kesekî bexşandî dikare bi qanûnî alîkariya koçberîyê li Australya bide.

## Ajanên koçberên qeydkirî

Divê ajanên koçberîyê yê qeydkirî (Registered migration agents) hin zanyarî û daxwazên karakteran ji bo bêne lîstekirin li ser Register of Migration Agents li ser malpera Office of the Migration Agents Registration Authority (OMARA) heye [www.mara.gov.au](http://www.mara.gov.au)

## Karmendên Yasayî

karmendê yasayî parêzerek e xwediyê bawernameya qanûnî ya Australya ye. Karmendên qanûnî dikarin alîkariya koçberî bidin li gorî bi karanîna qanûnê.

## Kesên bexşandî

Dibe ku mirov bi awayê qanûnî alîkariya koçberîyê bide eger ji bo alîkariya wan bi belaş be û ew:

- nûner, sponser yan endamê malbate yê nêz yê daxwazkerê vîzeyê
- endamê perlemanê yan endamê karûbarên dîplomasî, posta konsolosiyê yan jî organîzasyonêke navneteweyî
- kesên di bin *Public Service Act 1999* kar dikin yan jî endamê xizmeta giştî ya kantonekê yan Axa ku di çarçoveya karê wan de alîkariya koçberîyê dide
- kesê ku alîkariya belaş dide da ku ji wezîr re radestkirinê amade bike.

## Agahiyên bêhtir

Ji bo agahiyên bêhtir li ser kî dikare alîkariya koçberîyê li Australya bide, ji kerema xwe serdana malpera Department of Home Affairs rûpela [‘Who can help you with your application?’](#).

## Agansên perwerdeyê

Agansên perwerdeyê ne kesên bexşandî ne û nikarin bi yasayî alîkariya koçberî li Australya bidin eger ew ne kargêrekên koçberî qeydkirî bin yan jî karmendên qanûnî bin.

## Cezayên dayîna alîkariya koçberîyê ya ne qanûnî

Qedexa ye eger kesek alîkariya koçberîyê li Australya, eger ew kes ne aganê koçberî yê tomakirî be, Karmendên Yasayî yan Kesekî bexşandî be.

Cezayê ji bo alîkariya koçberîyê ya ne qanûnî dikare heta 10 salan cezayê girtîgehê be.

## Raporta alîkariya koçberîyê ya ne yasayî

Her kesê ku li Australya alîkariya koçberîyê ya neqanûnî bide, divê bi karanîna [Border Watch Online Report](#) li ser malpera Department of Home Affairs bê raportkirin.

Tîrmeha 2021